Newroz Hejmar (75) Rûpel (5) Êlûn 2007z – 2619k

Koçberkirina hevalê hêja û giranbuha Mamoste Edîb Ibrahîm

Memê Alan

Piştî jiyaneke dirêj bi nexwaşiyek kambax û xedar (nexwaşiya zeletanê) re , piştî ku sê caran nexwaşiya xwînrawestanê li mamoste Edîb dixîn e , mamosteyê me yê mezin , li roja 18.8.2007an êvarî , li Almaniya bajarê "Axin" li welatê biyaniyê dil radiweste , stêrka wî dirije û temenê xwe dide beşdaran . Dûv re nûçeya mirina mamoste belav dibe , meriv , heval, dost û hogirên wî ji hemî welatên Ewropa têne ba wî , ta ku silava dawiyê lê bikin û xatirxastinê jê bixwazin . Ew lê komdibin , tevle hevaljiyana wî diya Pêşrew û Zeredeşt cendek û canê wî yê paqij dişon û vedişon , cilên wî lêdikin , xelata zêrîn ya partiya wî Partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê bi sîngdixin , di ala rengîn werdidin , û yek û yek enî û çavên wî radimûsin xatirê xwe jê dixwazin . Herweho hevalên wî li wir cîgeheke sersaxiyê jeer vedikin , da ku , xelkê me yê Kurd li derve , nas û xisimên wî , sere heval û xwediyên xebatkarê xwe yê gewre saxbikin .

Li roja 25.8.2007 an , heval û hogirên koçberê me , bi cendeka xebatkarê xwe re bi rêdikevin û li balefirê sîwar dikin ta ku , li gor daxwaza wî di axa welêt de , li ciyê jidayîkbûna wî bê veşartin . Wê rojê ji kat 7 ê êvarî de , bi sedan meriv , xisim , nas , hevalên partiyên kurd ên bira , heval û hogirên wî jin û mêr , xort û keç , li balefirgeha Helebê pêşwaziya mamoste Edîb û xanima wî dikin . Lê mixabin ji ber nerazîbûna şofênîzma rijîma Sûriya ji xebata mamoste , cendeka wî heya dû nîvê şevê bi derengî hîştin taku dan destên me . wê şevê bi xemgînî . karwanê otombîlan hêdî hêdî tabûta mamoste bi rêxistin û birin Efrîna li ber dilê wî delal , pişt re jî gundê Maratê , mala birê wî . Ez dixwazim gotinek mamoste di dermafê axa welêt de , li welatê biyaniyê , ji xwendevanan re bibêjim " Xwezî mistek ax ji Efrînê li virba û min ramûsanda " .

Li roja dî 26.8.2007an , bi hezaran xelkê me yê Kurd , çi meriv , heval û hogirên nemir , nûnerên partiyên Kurd ji hemî deveran Kurdax , Heleb , Kobaniyê , Cezîr , Şam û Laziqiyê li gundê Maratê komdibin . Herweha li kat 10 ê sibê cendeka mamoste bavê Pêşrew ji mala birê wî bi lîliyan derdikeve , tîpên folklorî bi cilên Kurdî wêneyên zavê me di singê her yek ji wan de daliqandî û baxên gul û çîçekên rengarengî di destên wan de , li dû otombîla ku , mamoste hilgirtî dimeşiyan û dûvre jî cemawerê heyî bi rêdiket û berve goristan û mezela gund hildigirîn . Paşê jî li ser mêzel li ser têtе nimêjkirin û bi vî awî gewda wî ya paqij di nav gornên herdu biran de li ser daxwaza wî binax dibe . Herweha piştî telqîna xocê gun ev gotin li ser têne xwendin .

1- Gotina Hevbend û Eniya Kurd li Sûriyê .

2- Gotina tevgera Elwîfaq El Kurdî li Sûriyê

D .R(11)